# MAIN
# ***M**ultilingual **A**ssessment **I**nstrument for **N**arratives*

N. Gagarina, D. Klop, S. Kunnari, K. Tantele,
T. Välimaa, U. Bohnacker & J. Walters

## Kurmanji version

Translated and adapted by
Yaşar Kırgız
in collaboration with Natalia Gagarina

(based on the revised version in English)

© ZAS Papers in Linguistics 64 (2020)

**How to cite this version**:
Gagarina, N., Klop, D., Kunnari, S., Tantele, K., Välimaa, T., Bohnacker, U. & Walters, J. (2020). MAIN: Multilingual Assessment Instrument for Narratives. Revised version. *ZAS Papers in Linguistics*, *64*. Kurmanji version. Translated and adapted by Kırgız, Y. in collaboration with Gagarina, N.

**MAIN: Kurmanji version (Versiyona Kurmancî)***

**Enstrumana (amûra) Pirzimanî Ya Pîvandinê Ji Bo Çîrokgotinê**

Yaşar Kırgız bi hevkariya Natalia Gagarina

MAIN (*The Multilingual Assessment Instrument for Narratives*) dikare wekî enstrumana pirzimanî ya pîvandinê (nirxandinê) ji bo çîrokgotinê li Kurmancî were wergerandin. Ev enstruman di sala 2012an de hatiye amadekirin da ku karîna çîrokgotina zarokan were nirxandin. MAIN dikare hem ji bo zarokên ku bi zimanekî hem jî yên ku bi pirzimanan mezin dibin were bikaranîn. Ev enstruman bi taybetî ji bo zarokên ku temenê wan kêm zêde di navbera 3 û 10 salan de ye hatiye amadekirin. Lê wekî ku di xebatên dawî de derdiçe MAIN dikare ji bo zarokên temenmezin, ciwanan û kesên temenmezin jî were xebitandin. Bi MAINê fêmkirin û gotina çîrokan tê pîvandin û MAIN derfetê dide ku zimanên cuda yên zarokekê/î an jî kesekê/î werin nirxandin. Ji bo vê nirxandinê jî MAIN xwedî van rêbazan e: mînakçîrok (*model story*), vegotin/paş(ve)gotin (*retelling*) û gotin (*telling*). Versiyona 2012an ya MAINê li ser bingeha pêkanînên pîlot yên berfireh hat pêşxistin. Zêdetirî 500 zarokên yekzimanî û duzimanî tevli pêkanînên pîlot bûne. Temenê van zarokan di navbera 3 û 10 salan de bûye. Herwiha, ji bo testên pîlot tevlibûna 15 ziman û kombînasyona van zimanan wekî bingeh hatiye girtin.

Sala 2019an versiyona îngilîzî hat serrastkirin (revîzekirin). Ev serrastkirin li ser bingeha 2,500 çîrokên MAINê ku hatine transkrîbekirin û 24,000 bersivên ku ji bo pirsên fêmkirine hatine dayîn, pêk hat. Ev dane (*data*) digel 700 zarokên yekzimanî û duzimanî li Almanya, Rûsya û Swêdê hatin berhevkirin. Versiyona kurmancî ya li ber destê we xwe dispêre versiyona dawî ya îngilîzî ya sala 2019an.

MAIN ji çar çîrokên paralel pêk tê. Her çîrok ji şeş rêzewêneyan bi baldarî hatiye afirandin û ev wêne di warê avakirina çîrokê de bi hev re girêdayî ne. MAINê ev tişt di dema amadekirinê de dane ber çavan: Kompleksbûna tekstê ji aliyê zîhnî û zimannasî ve, paraleliya dêsmana (avasazîya) mîkro û makro û taybetmendiyên çandan.

Herçiqas MAIN hîn nebûbe xwedan norm jî, lê belê xwedî pêkanînên standard e û dikare ji bo nirxandina asta ziman/zimên, pêşîlêgirtinê (*intervention*) û armancên lêkolînê were bikaranîn. Ji bo agahiyên zêdetir ka çawa MAIN tê bikaranîn, bi kerema xwe li vê jêderê binêrin: “*Paşxaneya MAINê – Serrastkirî, bikaranîn û adaptekirina wê ji bo zimanên din*” (bi îngilîzî) ZAS Gotarên Zimannasiyê 63 (rûpel iv-xii). Jêder berdest e li ser vê lînkê: https://zaspil.leibniz-zas.de/issue/view/53.

Naveroka vê xebatê:

- Qaîdeyên pîvandinê
- Protokol û rûpelên pîvandinê ji bo çîrokan *(pisîk, kûçik, çêlik, karik)*
- Pirsên di derbarê jiyana zarok de
- Tekstên çîrokan

---

* Versiyonên kevn yên vê xebatê ji aliyê Salih Akin û Ercan Aras ve hatin xwendin. Her duyan jî pêşniyazên girîng kirin û bi alîkariya wan ev versiyona nû hate pêşxistin. Dîsa Rojda Emine Yaşîk, Alan Dilpak, Ömer Delikaya û Hüseyin Kartal di derbarê serrastkirina vê versiyona nû de alîkariya me kirin. Em ji bo van şes kesan dixwazin li vir spasiya xwe bînin ziman. Mala wan ava.

**Qaîdeyên Pîvandinê**
MAIN bi taybetî ji bo zarokên ku temenê wan kêm zêde di navbera 3 û 10 salan de ye hatiye armanckirin, lê dikare ji bo zarokên temenmezin, ciwanan û kesên temenmezin jî were bikaranîn. MAIN hem têgihîştin hem jî gotina çîrokan dipîve. Dîsa bi MAINê hilberînên *(elicitation)* cuda yên daneyan pêkan in/mimkun in, wekî: Mînakçîrok, Vegotin û Gotin. Hilbijartina cureya hilberînê li gorî armancên pîvandinê diguhere (Bi tercîha lekolîner ve maye).

Bi dîzayna MAINê zimanên cuda yên zarokekê/î dikarin werin pîvandin. Ne girîng e ku kîjan ziman pêşî tê pîvandin/nirxandin. Le divê di navbera testkirina duzimanan de hinek wext derbas bibe (4 heta 7 rojan ideal in).  Ev şêwaz ji bo pêşîlêgirtina tesîra zimanan li ser hev e (*cross-language influence*). Dîsa bi vê şewazê, zarok di gotina zimanê duyemîn de di bin bandora gotina zimanê yekemîn de namîne. Baştir e ku, zarokek ji herdu zimanan ji aliye heman (eynî) kesî ve neyê pîvandin. Sedema vê yekê jî ev e ku, zarok xwe tenê di zimanekî de hîs bike û rê li ber kod-guherînê (*code-switching*) were girtin.


<u>Materyal</u>

- 4 wêneçîrok: pisîk, kûçik, çêlik, karik (ji her wêneçîrokê 3 kopiyên bi reng), her kopiyek di nav zerfekê de ye, tevde 12 zerf in.
- 4 tekstên çîrokan (çêlik, karik, pisîk û kûçik)
- Cîhazên qeydkirinê (deng an jî vîdyo)
- Kaxizên nirxandinê (protokol) ji bo analîzkirina tekstan ji aliyê asta makro (gewre) de, peyvên rewşa navxweyî (*internal state terms*) de û pirsên ji bo tespîtkirina têgihîştinê.
- Pirsên di derbara jiyana zarok de (bi rêya pirsan di gel dê û bavan)

<u>Qaîdeyên Pêkanînê (*Instructions*)</u>

**Çawa materyal tên amadekirin**

1. Wêneyan daxînin ji: www.leibniz-zas.de/en/service-transfer/main
2. Wêneyan ji çaperê/çapker *(printer)* 3 caran bi reng û di ebata A4 de çap bikin (her wêne divê di meziniya 9 x 9 de be). Wêne divê zelal werin çapkirin.
3. Rêza wêneyan li ser pişta wan bixin (1-6)
4. Wêneyan wekî du rêzan bibirin
5. Her du rêzan bi hev ve binûskînin û jê rêzeka 6-Wêne çêbikin, wekî li bin tê nîşandan. Dû re ji du wêneyan qetekî pêk bînin (wêne 1 û 2 qetek, wêne 3 û 4 qetek, wêne 5 û 6 qetek).



* Nîşe *(note):* Wêne tenê nîşan dide ka çawa wêneyên çîrokan tên rêzkirin. Wêneyên ji bo testê divên werin daxistin (li adresa jor binêrin)

6. Her wêneçîrokê bixin nav zerfeke cuda. Ji bo ku çîrok karibin werin cudakirin, divê ku her zerfek bi rengekî be an jî bi tiştekî din were diyarkirin. Wekî mînak, meriv dikare zerfan bi xalan *(dots)* tasnîf bike.

**Pêkanîna Pîvandinê**

- Divê hûn protokolên nirxandinê û qaîdeyên bikaranîna testê baş bizanibin.
- Cîhaza qeydkirinê (deng/vîdyo) amade bikin. Divê qeydkirin berî amadekirina zarok dest pê bike û hemû dema testê û bersivên zarokan yên pirsên têgihiştinê jî bixe nav xwe.
- Dirêjiya dema amadekirinê bi tecrûbeyên berê ve û çanda heyî *(cultural environment)* ve girêdayî ye. Gava hûn bi zarok re dipeyvin, hinek pirsan bipirsin da ku hûn misoger bin ka zarok pirsên hêsan (*W-Questions*) fêm dike yan na. Bo nimûne hûn dikarin bipirsin: *Hevala/ê te ya/yê herî baş kî ye? Tu çi hez dikî di televziyonê de temaşe bikî? Tu ji çîrokgotinê hez dikî? Tu ji guhdarkirina çîrokan hez dikî?*
- Berî ku test dest pê bike, divê 3 zerfên bi heman wêneçîrokê li ser masê bin. (Bi van 3 zerfan armanc ew e ku zarok bifikire lêkolîner nizane wê zarok kîjan çîrokê hilbijêre. Bi vê rebazê pêşî li zanîna parvekirî (*shared knowledge*) tê girtin.)
- Divê hûn testê li gor qaîdeyên wê bi kar bînin. Bi kerema xwe ji bo teşwîqkirinê *(prompts)* li gorî pêşniyazan tev bigerin (li nimûneyên li jêr ji bo teşwîqkirinê binêrin).
- Hinek agahiyên zêdetir di derheqa pêkanîna MAINê de ev in: Divê zarok di dema testê de li hemberî we rûne û rûyê wêneyan ber bi xwe û dûrî we bigire. Gava ku zarok wênê ji nav zerfê derxistin, jê re bibêjin wêneyan veke û ji destpêkê heta dawiyê li hemûyan binêre. Jê re bibêjin: *Li wêneyan binêre, lê nîşanî min nede. Tenê TU dikarî bibînî.* (Heke girtin, yan jî rêzkirina wêneyan ji zarok re zehmet be, jê re bibin alîkar. Lê divê rûyê wêneyan ber bi aliyê zarok ve be û hûn li wêneyan nenêrin).
- Heke zarok ji bo gotina çîrokê amade be, jê re bibin alîkar û wêneyan jê re bikin sê qat dîsa. Di dema qatkirinê de jî divê hûn li wêneyan nenêrin û wêne di destê zarok de bimînin. Ji zarok re bibêjin ku bi du wêneyên ewil dest pê bike û çîrokê bibêje. Dema ku zarok herdu wêne safî kirin, dikare wêneyên 3mîn û 4mîn vebike û wan jî bibêje (wêne 1, 2, 3, 4 niha vekirî ne). Dawiyê jî divê wêneyên 5mîn û 6mîn vebike û wan jî bibêje (hemû wêne niha vekirîne).
- Heke zarok gotin/vegotin xelas kir, pirsên têgihîştinê bidin nasandin. Hûn dibêjin: *Niha ez ê çend pirsan li ser çîrokê ji te bipirsim.* Dema ku pirsên têgihîştinê tên pirsîn, divê çîrok hemû vekirî be û ji alî zarok û lêkolîner ve were xuyakirin.
- Piştî ku test bi dawî bû, gotina/vegotina çîrokê/çîrokan bixin ser nivîsê (transkrîpsiyon) û performansa zarok ji aliyê têgihîştin (rezeptîv) û gotinê ve (produksiyon) binirxînin. Ji bo vê yekê jî protokolên nirxandinê bi kar bînin.
- **Ji bîr neke:** Di protokolên nirxandinê de hemû bersiv (opsiyon) nehatine rêzkirin. Puan dikarin werin dayîn, heke bersiveke maqûl di asta makro (armanc, tevger, encam, peyvên rewşa navxweyî) de were dayîn. Heke nirxandina bersivekê zehmet be, serî li rêberpirtûkê (*manual*) bidin.

**Teşwîqkirin**

1. Pêwîst e, hûn di dewsa zarok de dest bi çîrokê nekin. Zarok teşwîq bikin, da ku ew çîrokê bibêje. Hûn dikarin bi tiliya xwe çîrokê nîşan bidin û bibêjin: *Ka ji min re çîrokê bibêje.*
2. Heke zarok tiştekî nebêje û diyar e wê tiştekî nebêje hûn dikarin piştî herî kêm 10 saniyeyan wî/wê teşwîq bikin. Hûn dikarin bibêjin: *Belê… Baş e… Niha dora te ye…* Di derheqa teşwîqkirinê de GELEKÎ baldar bin da ku cudahî nekevin navbera grubên tên lêkolînkirin û pêşî li bandora lêkolîner (*experimenter effects*) were girtin. Heke zarok piştî derdora 10 saniyan dîsa jî tiştekî nebêje, hûn dikarin bibêjin: *Bibêje, çi di çîrokê de çêdibe*? Heke zarok di nîva çîrokê de dev ji gotina çîrokê berde, zarok teşwîqî berdewamkirinê bikin. Hûn dikarin wekî mînak bibêjin: *Tiştekî din? Berdewam bike? Dikarî hinekî din jî bibêjî? Binêre, ka hîn çi di çîrokê de çêdibe?*
3. Zarok çawa bixwaze, wisa dikare behsa fîgûrên çîrokê bike. Gotinên zarok serrast nekin. Heke zarok nikare bûyerekê, fîgûrekê bi nav bike û zehmetiyan bikşîne an jî alîkariyê bixwaze, wî/wê teşwîq bikin. Hûn bo nimûne dikarin bibêjin: *Tu çawa dixwazî, wisa dikarî bi nav bikî, tu dixwazî çawa bi nav bikî?*
4. Tu pirsên bi vî şiklî nepirsin:

a) *Ew li vir çi dike? Kî direve?*
b) *Ew çi ye? Tu li ser wênê çi/kê dibînî?*
(Ji bo ku axaftina zarok neyê birîn, bibandorkirin, hevok nîvçe nemînin û herwiha peyv û hevokên nîşandanê (*deixis*) neyên bikaranîn).

5. Heke zarok bi serpêhatiyeke xwe dest bi gotinê bike, bo nimûne bibêje: *Min çivîkeke wisa îro sibeh dît* an jî *Ez ê îro piştî dibistanê bi diya xwe re biçim dikanê…* Bihêlin bila zarok hinek behsa vî tiştî bike. Pişt re ji zarok bi awayekî nazik bixwazin ku wêneçîrokê bibêje. (Tiştên ku zarok derveyî wêneçîrokê dibêje neyên analîzkirin).
6. Heke li gor tecrûbeyên we pêwîst be, hûn dikarin piştî parçeyekî (piştî du wêneyan) ji zarok re peyvên wisa: *Baş e, gelek baş e* bibêjin. Ew ji bo motîvasyona zarok e. (Dema xistina ser nivîsê de hûn bi rêya van peyvan dikarin bizanin jî, ka kîjan tişt li ser kîjan wêneyan hatiye gotin). Lê heke ev peyv zirarê bidin gotin û fikirîna zarok, wan nebêjin.

**Encamên MAINê di navbera çîrokan de çawa dikarin werin/neyên muqayesekirin**

- Heke hûn zarokeke/î duzimanî ji herdu zimanên wê/wî test dikin, çîroka pisîkê û/an kûçik ji bo zimanekî û çîroka çêlikê û/an karikê ji bo zimanê din bikar nînin.
- Dîsa çîroka pisîkê û/an kûçik ya ku di demekê de pêk hat bi çîroka çêlikê û/an karikê ku di demekê din de pêk hat muqayese nekin.
- Çima? Çîrokên MAINê nikarin rasterast bi her awayî bi hev re werin muqayesekirin. Wekî ku ji encamên dawî de derdiçe, di navbera çar çîrokan de cudahiyên piçûk hene, bi taybetî di derheqa pirsên têgihiştinê de. Çîroka çêlikê û ya karikê ji aliyekî û ya pisîkê û kûçik ji aliyê din hema bêje wekî hev in. Lê çîroka pisîkê û kûçik hinekî ji çîroka çêlikê û ya karikê cudatir in. Cudahî bo nimûne, di herîkîna mijarê de *(plotline),* di hejmara fîgûran de û di pirsên têgiştinê de hene.
  Ji ber vê yekê misoger bin ku hûn sêvan bi hirmiyan ve muqayese nekin.
- Gava hûn grûpên zarokan bi MAINê test dikin, misoger bin ku hûn prosedûrên hevsengiyê/balansê pêk tînin da ku tesîra cudabûyîna çîrokan û rêbaza hilberînê li ser encaman neke (vegotin, mînakçîrok, gotin).

<u>Pêşîlêgirtina Hevsengiyê**/**Balansê (*Counterbalancing*) Ji Bo Lêkolînên Zanîstî</u>
Pêwîst e, dora pêşkêşkirinê ji aliyê ziman/zimên û çîrokê ve li ser bingeha guherînê (*counterbalancing*) were amadekirin. (pisîk/kûçik bi taybetî ji bo vegotin/mînakçîrokê û çêlik/karik ji bo gotinê). Ji bo prensîpa guherînê (*counterbalancing*), dora ku li bin hatiye rêzkirin, bi kar bînin. (Heke zarok tenê di zimanekî de were pîvandin, dora 1, 2, 5, 6 an 3, 4, 7, 8 bi kar bînin):

| Hejmara Zarok | Ziman | Mînakçîrok/ Vegotin | Gotin | Ziman | Mînakçîrok/ Vegotin | Gotin |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Z1 | Pisîk | Çêlik | Z2 | Kûçik | Karik |
| 2 | Z1 | Pisîk | Karik | Z2 | Kûçik | Çêlik |
| 3 | Z2 | Pisîk | Karik | Z1 | Kûçik | Çêlik |
| 4 | Z2 | Pisîk | Çêlik | Z1 | Kûçik | Karik |
| 5 | Z1 | Kûçik | Çêlik | Z2 | Pisîk | Karik |
| 6 | Z1 | Kûçik | Karik | Z2 | Pisîk | Çêlik |
| 7 | Z2 | Kûçik | Karik | Z1 | Pisîk | Çêlik |
| 8 | Z2 | Kûçik | Çêlik | Z1 | Pisîk | Karik |

Nîşe*:* Encamên çîrokên cuda û encamên ku bi rêbazên cuda hatin hilberandin nikarin rasterast bi hev re werin muqayesekirin (li jor behsa vê mijarê hate kirin)

**Protokola Çîroka Pisîkê**

Gotin / Vegotin / Mînakçîrok

| | |
|---|---|
| Navê zarok | ______________________ |
| Dema jidayikbûnê | ______________________ |
| Dema testê | ______________________ |
| Temenê zarok di dema testê de (bi mehan) | ______________________ |
| Keçik/Lawik | ______________________ |
| Lêkolîner | ______________________ |
| Demdirêjiya temasê/têkiliyê bi Z2mîn re (bi mehan) | ______________________ |
| Dema destpêka hêlînê | ______________________ |
| Navê hêlînê | ______________________ |

Berî ku test dest pê bike, misoger bin ku hemû zerf li ser masê bin. Cîhaza qeydkirinê amade bikin. Berî amadekirina zarok dest bi qeydkirinê bikin.

**Dema Amadekirina Zarok**
Wekî mînak bipirsin: *Hevala/ê te ya/yê herî baş kî ye? Tu çi hez dikî di televziyonê de temaşe bikî? Tu ji çîrokgotinê hez dikî? Tu ji guhdarkirina çîrokan hez dikî?*

**Qaîdeyên Pêkanînê (*Instructions*)**

**Qaîdeyên Pêkanînê Ji Bo Gotinê**

Li hemberî zarok rûnin. Ji zarok re bibêjin: *Binêre li vir 3 zerf hene. Di her zerfekê de çîrokeke cuda heye. Zerfekê hilbijêre û çîroka di nav de ji min re bibêje.* Wêneyan bi şiklekî vebikin ku tenê zarok tevahiya çîrokê bibîne. Ji zarok re bibêjin: *Ji xwe re tevahiya çîrokê binêre! Tu amade yî?*

Wêneyên 1mîn û 2mîn vebikin. Dû re bibêjin: *Niha ez dixwazim, <u>tu</u> ji min re çîrokê bibêjî. Li wêneyan binêre û çîroka xwe ya <u>herî xweş</u> ji min re bibêje.* Heke zarok ji bo destpêkirinê teredût bike, hûn dikarin wisa alîkariya wî/wê bikin: *Ji min re çîrokê bibêje* (wêneyan nîşan bidin). Heke zarok gotina herdu wêneyên destpêkê xelas kir, wêneyên 3mîn û 4mîn vebikin. Bi vî awayî heta dawiya çîrokê dewam bikin. Heke zarok di nav gotina çîrokê de teredût bike an jî gotinê bibire, dikarin ev alîkarî werin dayîn: *Tiştekî din? Berdewam bike? Dikarî hinekî din jî bibêjî? Binêre, ka hîn çi di çîrokê de çêdibe?* Heke zarok gotina çîrokê bêyî ku diyar bike xelas bike, jê re bibêjin: *Gava te xelas kir, ji min re bibêje.*

Heke zarok çîrok bi dawî kir, hinekî wî/wê bipesinînin/bipesînin (bo nimûne, bibêjin aferîn) û pirsên têgihîştinê bipirsin.

**Qaîdeyên Pêkanînê Ji Bo Vegotinê**

Li hemberî zarok rûnin. Ji zarok re bibêjin: *Binêre li vir 3 zerf hene. Di her zerfekê de çîrokeke cuda heye. Zerfekê hilbijêre û ez ê ji te re çîroka di nav de bibêjim.* Wêneyan bi şiklekî vebikin ku tenê zarok tevahiya çîrokê bibîne. Ji zarok re bibêjin: *Ji xwe re tevahiya çîrokê binêre! Tu amade yî? Niha ez ê ji te re çîrokê bibêjim, piştre jî tu yê ji min re eynî çîrokê bibêjî.*

Wêneyên 1mîn û 2mîn vebikin, wêneyê 1min nîşanî zarok bidin û bibêjin: *Çîrok li vir dest pê dike. Rojekê pisîkek hebû ku ji lîstinê hez dikir. Vê pisîkê dît ku perperikeke zer li ser*

*deviyekê rûniştiye. Pisîkê hilpekir ser lingên xwe, ji ber ku wê dixwest perperikê bigire. Di vê gavê de kurikekî rûken bi gogekê û satilekê ji masîgirtinê dihat. Wî dît ku pisîk dide dû perperikê.*

Wêneyên 3mîn û 4mîn vebikin (niha wêneyên ji yê 1mîn heta yê 4mîn xuya dikin). *Lê perperik zû firî çû û pisîk jî kete nav deviyê. Pisîkê xwe êşand û gelekî aciz bû. Kurik jî wisa tirsiya ku goga wî ji dest wî ket. Gava ku dît goga xwe bi nav avê de diçe, kurik bang kir: "Ooo, goga min diçe!". Ew xemgîn bû û dixwest goga xwe dîsa bigire. Di vê gavê de, pisîkê satila bi masiyan ferq kir û fikirî: "Ooo ez masiyekî dixwazim."*

Wêneyên 5mîn û 6mîn vebikin (niha wêneyên ji yê 1mîn heta yê 6mîn xuya dikin). *Di vê gavê de kurik dest pê kir ku bi çengelê masîgirtinê goga xwe ji nav avê derbixe. Haya wî jê nebû ku pisîk ji xwe re masiyekî dibe. Dawiyê pisîk gelekî kêfxweş bû û masiyê tamxweş xwar û kurik jî kêfxweş bû, ji ber ku wî dîsa goga xwe girtibû.*

*Û wiha çîrok bi dawî dibe.*

Wêneyên 1mîn û 2mîn nîşanî zarok bidin. Divê tenê zarok wêneyan bibîne. Dû re bibêjin: *Niha ez dixwazim, tu ji min re çîrokê bibêjî. Li wêneyan binêre û çîroka xwe ya herî xweş ji min re bibêje.* Heke zarok ji bo destpêkirinê teredût bike, hûn dikarin wisa alîkariya wî/wê bikin: *Ji min re çîrokê bibêje* (wêneyan nîşan bidin). Heke zarok gotina herdu wêneyên destpêkê xelas kir, wêneyên 3mîn û 4mîn vebikin. Bi vî awayî heta dawiya çîrokê dewam bikin. Heke zarok di nav gotina çîrokê de teredût bike an jî gotinê bibire, dikarin ev alîkarî werin dayîn: *Tiştekî din? Berdewam bike? Dikarî hinekî din jî bibêjî? Binêre, ka hîn çi di çîrokê de çêdibe?* Heke zarok gotina çîrokê bêyî ku diyar bike xelas bike, jê re bibêjin: *Gava te xelas kir, ji min re bibêje.*

Heke zarok çîrok bi dawî kir, hinekî wî/wê bipesinînin (bo nimûne, bibêjin aferîn) û pirsên têgihîştinê bipirsin.

**Qaîdeyên Pêkanînê Ji Bo Mînakçîrokê**

Li hemberî zarok rûnin. Ji zarok re bibêjin: *Binêre li vir 3 zerf hene. Di her zerfekê de çîrokeke cuda heye. Zerfekê hilbijêre û ez ê ji te re çîroka di nav de bibêjim.* Wêneyan bi şiklekî vebikin ku tenê zarok tevahiya çîrokê bibîne. Ji zarok re bibêjin: *Ji xwe re tevahiya çîrokê binêre! Tu amade yî? Niha ez ê ji te re çîrokê bibêjim, piştre jî ez ê çend pirsan ji te bipirsim.*

Wêneyên 1mîn û 2mîn vebikin, wêneyê 1min nîşanî zarok bidin û bibêjin: *Çîrok li vir dest pê dike. Rojekê pisîkek hebû ku ji lîstinê hez dikir. Vê pisîkê dît ku perperikeke zer li ser deviyekê rûniştiye. Pisîkê hilpekir ser lingên xwe, ji ber ku wê dixwest perperikê bigire. Di vê gavê de kurikekî rûken bi gogekê û satilekê ji masîgirtinê dihat. Wî dît ku pisîk dide dû perperikê.*

Wêneyên 3mîn û 4mîn vebikin (niha wêneyên ji yê 1mîn heta yê 4mîn xuya dikin). *Lê perperik zû firî çû û pisîk jî kete nav deviyê. Pisîkê xwe êşand û gelekî aciz bû. Kurik jî wisa tirsiya ku goga wî ji dest wî ket. Gava ku dît goga xwe bi nav avê de diçe, kurik bang kir: "Ooo, goga min diçe!". Ew xemgîn bû û dixwest goga xwe dîsa bigire. Di vê gavê de, pisîkê satila bi masiyan ferq kir û fikirî: "Ooo ez masiyekî dixwazim."*

Wêneyên 5mîn û 6mîn vebikin (niha wêneyên ji yê 1mîn heta yê 6mîn xuya dikin). *Di vê gavê de kurik dest pê kir ku bi çengelê masîgirtinê goga xwe ji nav avê derbixe. Haya wî jê nebû ku pisîk ji xwe re masiyekî dibe. Dawiyê pisîk gelekî kêfxweş bû û masiyê tamxweş xwar û kurik jî kêfxweş bû, ji ber ku wî dîsa goga xwe girtibû.*

*Û wiha çîrok bi dawî dibe.*

Piştî ku we çîrok ji zarok re got û xelas kir, pirsên têgihîştinê bipirsin.

## Kaxiza Nirxandinê Ji Bo Çîroka Pisîkê

### Beşa 1mîn: Produksiyon

A. Sazkirina Çîrokê (*Story structure*); B. Kompleksbûna Çîroksazkirinê (*Structural complexity*); C. Peyvên Rewşa Navxweyî, PRN (*Internal state terms*)

### A. Sazkirina Çîrokê

| | | **Mînakên bersivên rast**[1] | **Puan** |
|---|---|---|---|
| **A1.** | Çarçove (*Setting*) | Dem û/an cihê bûyerê: wekî hebûûû, tunebûûû/rojekê/demeke dûr…<br>li ber behrekê/li ber behrê/li ber çemekê/avê/li ser mêrgekê (giha(ye)kî)… | 0 1 2[2] |
| *Epîsode 1: Pisîk (Fîgûr: Pisîk û Perperik)* | | | |
| **A2.** | PRN wekî destpêka bûyerê | **Pisîkê** ji lîstinê hez dikir/pisîk bi meraq bû<br>**Pisîkê** perperikek dît. | 0 1 |
| **A3.** | Armanc (*Goal*) | **Pisîkê** dixwest perperikê bigire/bi dest bixe/bide dû/pê re bilîze.<br>(Da ku) + LÊKER (bigire, bi dest bixe, pê re bilîze). | 0 1 |
| **A4.** | Tevger (*Attempt*) | **Pisîkê** xwe pêş de avêt.<br>**Pisîkê** da dû perperikê/dest pê kir ku bide dû.<br>**Pisîkê** hewl da + LÊKER (bigire, bi dest bixe) | 0 1 |
| **A5.** | Encam (*Outcome*) | **Pisîk** kete nav deviyê/nikarî perperikê bigire/bi têra xwe ne bi lez bû.<br>**Perperik** filitî/ji wir firî/ji pisîkê bi leztir bû. | 0 1 |
| **A6.** | PRN wekî reaksiyon | **Pisîk** hêvîşkestî/aciz/bi êş bû.<br>**Perperik** bi kêf bû. | 0 1 |
| *Epîsode 2: Kurik (Fîgûr: Kurik)* | | | |
| **A7.** | PRN wekî destpêka bûyerê | **Kurik** xemgîn bû**/**ne bi kêf bû/xem dikir ji bo goga xwe.<br>**Kurik** dît ku goga xwe di nav avê de ye. | 0 1 |
| **A8.** | Armanc (*Goal*) | **Kurik** biryar da/dixwest goga xwe dîsa bi dest bixe.<br>(Da ku) + LÊKER (bigire). | 0 1 |
| **A9.** | Tevger (*Attempt*) | **Kurik** goga xwe ji nav avê derdixist/derdixe/hewl dida ku goga xwe ji nav avê derbixe. | 0 1 |
| **A10.** | Encam (*Outcome*) | **Kurik** goga xwe (dîsa) bi dest xist/xwedî goga xwe bû.<br>**Gog** xelas bû. | 0 1 |
| **A11.** | PRN wekî reaksiyon | **Kurik** kêfxweş/şad/rihet bû (ji ber bidestxitina/xwedîbûna goga xwe). | 0 1 |
| *Epîsode 3: Pisîk (Fîgûr: Pisîk)* | | | |
| **A12.** | PRN wekî destpêka bûyerê | **Pisîkê** masî dît/ferq kir.<br>**Pisîk** birçî bû/bi merak bû/dilê wê çû mêsî. | 0 1 |
| **A13.** | Armanc (*Goal*) | **Pisîkê** dixwest/biryar da mêsî ji xwe re bibe/bi dest bixe/bixwe/bidize. | 0 1 |

[1] Heke bersiva zarok ne zelal be an jî di kaxiza nirxandinê de nebe, li rêberpirtûkê (*manual*) binêrin.
[2] Sifir puan ji bo bersiva şaş an jî bersivek nehatibe dayîn, puanek ji bo bersiveke rast, du puan ji bo binavkirina dem û cih.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | | (Da ku) + LÊKER (bixwe, bigire). | |
| **A14.** | Tevger (*Attempt*) | **Pisîkê** xwe diavête (ser) mêsî/masî dikişand/dibir/didizand/xwe dirêjî mesî dikir.<br>**Pisîk** xwe diavêje (ser) mêsî/mêsî dikşîne/dibe (ji satilê)/xwe dirêjî mesî dike.<br>**Pisîk** hewl dide + LÊKER (bi dest bixe, bibe) | 0 1 |
| **A15.** | Encam (*Outcome*) | **Pisîkê** masî xwar/masî bi dest xist. | 0 1 |
| **A16.** | PRN wekî reaksiyon | **Pisîk** kêfxweş bû/şad bû/nema êdî birçî bû. | 0 1 |
| **A17.** | | **Tevahiya puanên gihîştî ji 17:** | |

### B. Kompleksbûna Çîroksazkirinê

| Hejmara rêzên TE | Hejmara A yek bi yek (bê T an jî E) | Hejmara rêzên AT/AE | Hejmara rêzên ATE |
|---|---|---|---|
| B1. | B2. | B2. | B4. |
| | | | |

### C. Peyvên Rewşa Navxweyî (PRN)

| | |
|---|---|
| C1. | Hejmara Hemû Peyvan: *(Tokens)*:<br>**Peyvên Pêhesîne,** bo nimûne; dîtin, bihîstin, hîs kirin, bêhn kirin<br>**Peyvên Fîzyolojîk,** bo nimûne; tî, birçî, westî, bi êş, birîndar<br>**Peyvên Hişmendiyê *(Consciousness Terms)*,** bo nimûne; zindî (sax), şiyar (hişyar), raketî (razayî)<br>**Peyvên Hîsî,** bo nimûne; xemgîn, kêfxweş, şad, qehirî, bi xem, hêvîşikestî, bi tirs, bi xof, serfiraz, bi cesaret, xwe ewle hîs kirin, şaş/mat mayîn/bûyîn<br>**Peyvên Zîhnî,** bo nimûne; xwestin, fikirîn, zanîn, (ji) bîr kirin, biryar dan (dayîn), bawer kirin, xwedî plan/plan çêkirin<br>**Lêkerên Zimanî *(Linguistic Verbs)*,** bo nimûne; gotin, bang kirin, qîr kirin, hîşyar kirin, pirsîn |

## Beşa 2mîn: Têgihîştina Çîrokê

| | | Mînakên bersivên rast | Mînakên bersivên şaş | Puan |
|---|---|---|---|---|
| **0** | Kêfa te ji çîrokê re hat? | **Pirsa amadekirinê, bê puan** | | |
| **D1.** | Çima pisîk hilpêdike pêş/xwe diavêje pêş?<br>*(Wêneyên 1-2mîn nîşan bidin)*<br>(Epîsode 1: Armanc) | Dixwaze perperikê bi dest bixe/bigire/bide pey/pê re bilîze<br>Perperikê dixwaze<br>(Da ku perperikê) + LÊKER (bi dest bixe, bigire) | ji vir diçe/direve/dixwest hilpêke<br>Pisîk her gav(ê) hilpêdikin/direvin | 0 1 |
| **D2.** | Pisîk xwe çawa hîs dike?<br>*(Wêneyê 3mîn nîşan bidin)*<br>(PRN wekî reaksiyon) | bi hêrs/xerab/hêvîşkestî/ birîndar/bi êş/ne xweş/ne rihet. | baş/kêfxweş | 0 1 |
| **D3.** | *Pirsa D3 bipirsin, heke zarok bersiva D2 rast dabe, lê sedem bi nav nekiribe. Heke sedem bi nav kiribe, puanekê ji bo D3 jî bidin zarok û derbasî pirsa D4 bibin.*<br>Bi fikra te, çima pisîk bi hêrs/hêvîşkestî/bi êş hwh. e/ye?[3] | Nikarîbû perperikê bigire/kete nav deviyê/wê biêşe ku yek bikeve nav deviyê<br>Perperik filitî/revî çû | bersiveke ne rast/bê eleqe | 0 1 |
| **D4.** | Çima çengelê kurik yê masîgirtinê di nav avê de ye?<br>*(Wêneyê 5mîn nîşan bidin)*<br>(Epîsode 2: Armanc) | Dixwaze (dîsa) goga xwe bi dest bixe/bigire<br>(Dîsa) goga xwe dixwaze<br>(Da ku goga xwe [dîsa]) + LÊKER (bi dest bixe, bigire) | Dixwaze di avê de bilîze | 0 1 |
| **D5.** | Kurik xwe çawa hîs dike?<br>*(Wêneyê 6mîn nîşan bidin)*<br>(PRN wekî reaksiyon) | baş/pir baş/ kêfxweş/şad | xerab/bi hêrs/qehirî/ xemgîn | 0 1 |
| **D6.** | *Pirsa D6 bipirsin, heke zarok bersiva D5 rast dabe, lê sedem bi nav nekiribe. Heke sedem bi nav kiribe, puanekê ji bo D6 jî bidin zarok û derbasî pirsa D7 bibin.*<br>Bi fikra te, kurik çima xwe baş/kêfxweş/şad hwh. hîs dike?[4] | Xwedî goga xwe bû dîsa/gog bi dest xist dîsa.<br>Karîbû gogê + LÊKER (bi dest bixe/bigire) | Ew dikene/wisa xuya dike an jî bersiveke din ya ne rast/bê eleqe | 0 1 |
| **D7.** | Çima pisîk mêsî (masiyekî) bi dest dixe?<br>*(Wêneyê 5mîn nîşan bidin)*<br>(Epîsode 3: Armanc) | Biryar dide/dixwaze mêsî (masiyekî) bixwe/masî yê wê be/mêsî bidize<br>Perperik bi dest nexistibû/negirtibû/nikarîbû perperikê bi dest bixe/bigire | Dixwaze bi mêsî bilîze | 0 1 |

[3] Eynî (heman) PRN ya ku zarok di bersiva D2an de gotî, bi kar bînin
[4] Eynî (heman) PRN ya ku zarok di bersiva D5an de gotî, bi kar bînin

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | Pisîk ji masiyan hez dikin/masî tamxweş in (Bersivên gelemperî *[generic meaning]*) | | |
| **D8.** | Bifikire ku kurik pisîkê dibîne. Kurik wê xwe çawa hîs bike? *(Wêneyê 6mîn nîşan bidin)* (PRN wekî reaksiyon) | xerab/bi hêrs/xemgîn/qehirî/ ne xweş | baş/kêfxweş/şad | 0 1 |
| **D9.** | *Pirsa D9 bipirsin, heke zarok bersiva D8 rast dabe, lê sedem bi nav nekiribe. Heke sedem bi nav kiribe, puanekê ji bo D9 jî bidin zarok û derbasî pirsa D10 bibin.* Bi fikra te, kurik wê çima xwe xerab/bi hêrs/aciz hwh. hîs bike?[5] | Pisîkê masiyê wî xwar/bir Kurik dixwest mêsî (masiyekî) (bi xwe) bixwe/masî yê wî (bi xwe) be Ew masiyên kurik bûn | Çengelê wî li erdê ye/an jî bersiveke din ya ne rast/bê eleqe | 0 1 |
| **D10.** | Gelo kurik wê bi pisîkê re bibe heval? Çima? | na, ji ber... herî kem bersiveke maqûl. (ji ber ku pisîkê masî xwar/dizî) an jî bersivên din yên maqûl | erê/nizanim/an jî bersiveke din ya bê eleqe | 0 1 |
| **D11.** | | | **Tevahiya puanên gihîştî ji 10:** | |

[5] Eynî (heman) PRN ya ku zarok di bersiva D8an de gotî, bi kar bînin.

**Protokola Çîroka Kûçik**

Gotin / Vegotin / Mînakçîrok

| | |
|---|---|
| Navê zarok | ____________________ |
| Dema jidayikbûnê | ____________________ |
| Dema testê | ____________________ |
| Temenê zarok di dema testê de (bi mehan) | ____________________ |
| Keçik/Lawik | ____________________ |
| Lêkolîner | ____________________ |
| Demdirêjiya temasê/têkiliyê bi Z2mîn re (bi mehan) | ____________________ |
| Dema destpêka hêlînê | ____________________ |
| Navê hêlînê | ____________________ |

Berî ku test dest pê bike, misoger bin ku hemû zerf li ser masê bin. Cîhaza qeydkirinê amade bikin. Berî amadekirina zarok dest bi qeydkirinê bikin.

**Dema Amadekirina Zarok**

Wekî mînak bipirsin: *Hevala/ê te ya/yê herî baş kî ye? Tu çi hez dikî di televziyonê de temaşe bikî? Tu ji çîrokgotinê hez dikî? Tu ji guhdarkirina çîrokan hez dikî?*

**Qaîdeyên Pêkanînê (*Instructions*)**

**Qaîdeyên Pêkanînê Ji Bo Gotinê**

Li hemberî zarok rûnin. Ji zarok re bibêjin: *Binêre li vir 3 zerf hene. Di her zerfekê de çîrokeke cuda heye. Zerfekê hilbijêre û çîroka di nav de ji min re bibêje.* Wêneyan bi şiklekî vebikin ku tenê zarok tevahiya çîrokê bibîne. Ji zarok re bibêjin: *Ji xwe re tevahiya çîrokê binêre! Tu amade yî?*

Wêneyên 1mîn û 2mîn vebikin. Dû re bibêjin: *Niha ez dixwazim, <u>tu</u> ji min re çîrokê bibêjî. Li wêneyan binêre û çîroka xwe ya <u>herî xweş</u> ji min re bibêje.* Heke zarok ji bo destpêkirinê teredût bike, hûn dikarin wisa alîkariya wî/wê bikin: *Ji min re çîrokê bibêje* (wêneyan nîşan bidin). Heke zarok gotina herdu wêneyên destpêkê xelas kir, wêneyên 3mîn û 4mîn vebikin. Bi vî awayî heta dawiya çîrokê dewam bikin. Heke zarok di nav gotina çîrokê de teredût bike an jî gotinê bibire, dikarin ev alîkarî werin dayîn: *Tiştekî din? Berdewam bike? Dikarî hinekî din jî bibêjî? Binêre, ka hîn çi di çîrokê de çêdibe?* Heke zarok gotina çîrokê bêyî ku diyar bike xelas bike, jê re bibêjin: *Gava te xelas kir, ji min re bibêje.*

Heke zarok çîrok bi dawî kir, hinekî wî/wê bipesinînin (bo nimûne, bibêjin aferîn) û pirsên têgihîştinê bipirsin.

**Qaîdeyên Pêkanînê Ji Bo Vegotinê**

Li hemberî zarok rûnin. Ji zarok re bibêjin: *Binêre li vir 3 zerf hene. Di her zerfekê de çîrokeke cuda heye. Zerfekê hilbijêre û ez ê ji te re çîroka di nav de bibêjim.* Wêneyan bi şiklekî vebikin ku tenê zarok tevahiya çîrokê bibîne. Ji zarok re bibêjin: *Ji xwe re tevahiya çîrokê binêre! Tu amade yî? Niha ez ê ji te re çîrokê bibêjim, piştre jî tu yê ji min re eynî çîrokê bibêjî.*

Wêneyên 1mîn û 2mîn vebikin, wêneyê 1min nîşanî zarok bidin û bibêjin: *Çîrok li vir dest pê dike. Rojekê kûçikek hebû ku ji lîstinê hez dikir. Vî kûçikî dît ku mişkekî gewr li ber darekê rûniştiye. Kûçik hilpekir ser lingên xwe, ji ber ku wî dixwest mişk bigire. Di vê gavê de kurikekî rûken bi çentekî û balonekê ji tiştkirînê dihat. Wî dît ku kûçik dide dû mişk.*

Wêneyên 3mîn û 4mîn vebikin (niha wêneyên ji yê 1mîn heta yê 4mîn xuya dikin). *Lê mişk zû reviya çû û kûçik jî li darê ket. Kûçik xwe êşand û gelekî aciz bû. Kurik jî wisa tirsiya ku balona wî ji dest wî derket. Gava ku dît balona xwe bi ser darê re difire, kurik bang kir: “Ooo, balona min difire!”. Ew gelekî xemgîn bû û dixwest balona xwe dîsa bigire. Di vê gavê de kûçik çenteyê kurik yê bi sicûqan ferq kir û fikirî: “Ooo ez sicûqekî dixwazim.”*

Wêneyên 5mîn û 6mîn vebikin (niha wêneyên ji yê 1mîn heta yê 6mîn xuya dikin). *Di vê gavê de kurik dest pê kir ku balona xwe ji ser darê bîne jêr (xwar). Haya wî jê nebû ku kûçik ji xwe re sicûqekî dibe. Dawiyê kûçik gelekî kêfxweş bû û sicûqê tamxweş xwar û kurik jî kêfxweş bû, ji ber ku wî dîsa balona xwe girtibû.*

*Û wiha çîrok bi dawî dibe.*

Wêneyên 1mîn û 2mîn nîşanî zarok bidin. Divê tenê zarok wêneyan bibîne. Dû re bibêjin: *Niha ez dixwazim, <u>tu</u> ji min re çîrokê bibêjî. Li wêneyan binêre û çîroka xwe ya <u>herî xweş</u> ji min re bibêje.* Heke zarok ji bo destpêkirinê teredût bike, hûn dikarin wisa alîkariya wî/wê bikin: *Ji min re çîrokê bibêje* (wêneyan nîşan bidin). Heke zarok gotina herdu wêneyên destpêkê xelas kir, wêneyên 3mîn û 4mîn vebikin. Bi vî awayî heta dawiya çîrokê dewam bikin. Heke zarok di nav gotina çîrokê de teredût bike an jî gotinê bibire, dikarin ev alîkarî werin dayîn: *Tiştekî din? Berdewam bike? Dikarî hinekî din jî bibêjî? Binêre, ka hîn çi di çîrokê de çêdibe?* Heke zarok gotina çîrokê bêyî ku diyar bike xelas bike, jê re bibêjin: *Gava te xelas kir, ji min re bibêje.*

Heke zarok çîrok bi dawî kir, hinekî wî/wê bipesinînin (bo nimûne, bibêjin aferîn) û pirsên têgihîştinê bipirsin.

**Qaîdeyên Pêkanînê Ji Bo Mînakçîrokê**

Li hemberî zarok rûnin. Ji zarok re bibêjin: *Binêre li vir 3 zerf hene. Di her zerfekê de çîrokeke cuda heye. Zerfekê hilbijêre û ez ê ji te re çîroka di nav de bibêjim.* Wêneyan bi şiklekî vebikin ku tenê zarok tevahiya çîrokê bibîne. Ji zarok re bibêjin: *Ji xwe re tevahiya çîrokê binêre! Tu amade yî? Niha ez ê ji te re çîrokê bibêjim, pişt re jî ez ê çend pirsan ji te bipirsim.*

Wêneyên 1mîn û 2mîn vebikin, wêneyê 1min nîşanî zarok bidin û bibêjin: *Çîrok li vir dest pê dike. Rojekê kûçikek hebû ku ji lîstinê hez dikir. Vî kûçikî dît ku mişkekî gewr li ber darekê rûniştiye. Kûçik hilpekir ser lingên xwe, ji ber ku wî dixwest mişk bigire. Di vê gavê de kurikekî rûken bi çentekî û balonekê ji tiştkirînê dihat. Wî dît ku kûçik dide dû mişk.*

Wêneyên 3mîn û 4mîn vebikin (niha wêneyên ji yê 1mîn heta yê 4mîn xuya dikin). *Lê mişk zû reviya çû û kûçik jî li darê ket. Kûçik xwe êşand û gelekî aciz bû. Kurik jî wisa tirsiya ku balona wî ji dest wî derket. Gava ku dît balona xwe bi ser darê re difire, kurik bang kir: “Ooo, balona min difire!”. Ew gelekî xemgîn bû û dixwest balona xwe dîsa bigire. Di vê gavê de kûçik çenteyê kurik yê bi sicûqan ferq kir û fikirî: “Ooo ez sicûqekî dixwazim.”*

Wêneyên 5mîn û 6mîn vebikin (niha wêneyên ji yê 1mîn heta yê 6mîn xuya dikin). *Di vê gavê de kurik dest pê kir ku balona xwe ji ser darê bîne jêr (xwar). Haya wî jê nebû ku kûçik ji xwe re sicûqekî dibe. Dawiyê kûçik gelekî kêfxweş bû û sicûqê tamxweş xwar û kurik jî kêfxweş bû, ji ber ku wî dîsa balona xwe girtibû.*

*Û wiha çîrok bi dawî dibe.*

Piştî ku we çîrok ji zarok re got û xelas kir, pirsên têgihîştinê bipirsin.

**Kaxiza nirxandinê Ji Bo Çîroka Kûçik**

**Beşa 1mîn: Produksiyon**

A Sazkirina Çîrokê (*Story structure*); B. Kompleksbûna Çîroksazkirinê (*Structural complexity*); C. Peyvên Rewşa Navxweyî, PRN (*Internal state terms*)

## A. Sazkirina Çîrokê

| | | **Mînakên bersivên rast**[6] | **Puan** |
|---|---|---|---|
| **A1.** | Çarçove) *(Setting)* | Dem û/an cihê bûyerê: wekî hebûûû, nebûûû/rojekê/demeke dûr… li daristanekê/li parkekê/li ser mêrgekê (giha(ye)kî)/li zeviyekê/li ber darekê/nêzikî darkê li ber rê … | 0 1 2[7] |
| | | *Epîsode 1: Kûçik (Fîgûr: Kûçik û Mişk)* | |
| **A2.** | PRN wekî destpêka bûyerê | **Kûçik** ji lîstinê hez dikir/bi meraq bû.<br>**Kûçik** mişk dît. | 0 1 |
| **A3.** | Armanc *(Goal)* | **Kûçik** dixwest mişk bigire/bi dest bixe/ bide dû/pê re bilîze.<br>(Da ku) + LÊKER (bigire, bi dest bixe, pê re bilîze). | 0 1 |
| **A4.** | Tevger (*Attempt*) | **Kûçik** xwe pêş de avêt.<br>**Kûçik** da dû perperikê/dest pê kir ku bide dû.<br>**Kûçik** hewl da + LÊKER (bigire, bi dest bixe). | 0 1 |
| **A5.** | Encam (*Outcome*) | **Kûçik** serê xwe darê xist/li darê ket/nikarî mişk bigire/bi têra xwe ne bi lez bû.<br>**Mişk** filitî/revî paş darê/ji kûçik bi leztir bû. | 0 1 |
| **A6.** | PRN wekî reaksiyon | **Kûçik** hêvîşkestî/qehirî/bi êş bû.<br>**Mişk** bi kêf/rihet bû. | 0 1 |
| | | *Epîsode 2: Kurik (Fîgûr: Kurik)* | |
| **A7.** | PRN wekî destpêka bûyerê | **Kurik** xemgîn bû**/**ne bi kêf bû/xem dikir ji bo balona xwe.<br>**Kurik** dît ku balona xwe di nav darê de ye. | 0 1 |
| **A8.** | Armanc (*Goal*) | **Kurik** biryar da/dixwest balona xwe dîsa bi dest bixe.<br>(Da ku) + LÊKER (bi dest bixe). | 0 1 |
| **A9.** | Tevger (*Attempt*) | **Kurik** balona xwe ji darê dadixist/dadixe/hewl dida ku daxe/li pey balona xwe çû/ xwe dirêjî balonê kir/bi darê de hildikişiya. | 0 1 |
| **A10.** | Encam (*Outcome*) | **Kurik** balona xwe (dîsa) bi dest xist.<br>**Balon** xelas bû. | 0 1 |
| **A11.** | PRN wekî reaksiyon | **Kurik** bi kêf/kêfxweş/şad/rihet bû (ji ber bidestxitina/xwedîbûna balona xwe). | 0 1 |
| | | *Epîsode 3: Kûçik (Fîgûr: Kûçik)* | |
| **A12.** | PRN wekî destpêka bûyerê | **Kûçik** sicûq dît/ferq kir.<br>**Kûçik** birçî bû/bi merak bû/dilê wî çû sicûq. | 0 1 |
| **A13.** | Armanc (*Goal*) | **Kûçik** dixwest/biryar da sicûq ji xwe re bibe/bi dest bixe/bixwe/bidize.<br>(Da ku) + LÊKER (bixwe, bi dest bixe). | 0 1 |

[6] Heke bersiva zarok ne zelal be an jî di kaxiza nirxandinê de nebe, li rêberpirtûkê (*manual*) binêrin.
[7] Sifir puan ji bo bersiva şaş an jî bersivek nehatibe dayîn, puanek ji bo bersiveke rast, du puan ji bo binavkirina dem û cih.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **A14.** | Tevger (*Attempt*) | **Kûçik** xwe diavête (ser) sicûq/sicûq dikişand/dibir/didizand/xwe dirêjî sicûq dikir.<br>**Kûçik** xwe diavêje (ser) sicûq/sicûq dikşîne/dibe (ji çentê)/xwe dirêjî sicûq dike.<br>**Kûçik** hewl dide + LÊKER (bi dest bixe, bibe). | 0 | 1 |
| **A15.** | Encam *(Outcome)* | **Kûçik** sicûq xwar/ sicûq bi dest xist. | 0 | 1 |
| **A16.** | PRN wekî reaksiyon | **Kûçik** kêfxweş bû/şad bû/nema êdî birçî bû. | 0 | 1 |
| **A17.** | | **Tevahiya puanên gihîştî ji 17:** | | |

**B. Kompleksbûna Çîroksazkirinê**

| Hejmara rêzên TE | Hejmara A yek bi yek (bê T an jî E) | Hejmara rêzên AT/AE | Hejmara rêzên ATE |
|---|---|---|---|
| B1. | B2. | B2. | B4. |
| | | | |

**C. Peyvên Rewşa Navxweyî (PRN)**

| | |
|---|---|
| C1. | Hejmara Hemû Peyvan: *(Tokens)*:<br>**Peyvên Pêhesîne,** bo nimûne; dîtin, bihîstin, hîs kirin, bêhn kirin<br>**Peyvên Fîzyolojîk,** bo nimûne; tî, birçî, westî, bi êş, birîndar<br>**Peyvên Hişmendiyê *(Consciousness Terms)*,** bo nimûne; zindî (sax), şiyar (hişyar), raketî (razayî)<br>**Peyvên Hîsî,** bo nimûne; xemgîn, kêfxweş, şad, qehirî, bi xem, hêvîşikestî, bi tirs, bi xof, serfiraz, bi cesaret, xwe ewle hîs kirin, şaş/mat mayîn/bûyîn<br>**Peyvên Zîhnî,** bo nimûne; xwestin, fikirîn, zanîn, (ji) bîr kirin, biryar dan (dayîn), bawer kirin, xwedî plan/plan çêkirin<br>**Lêkerên Zimanî *(Linguistic Verbs)*,** bo nimûne; gotin, bang kirin, qîr kirin, hîşyar kirin, pirsîn |

**Beşa 2mîn: Têgihîştina Çîrokê**

| | | Mînakên bersivên rast | Mînakên bersivên şaş | Puan |
|---|---|---|---|---|
| **0** | Kêfa te ji çîrokê re hat? | **Pirsa amadekirinê, bê puan** | | |
| **D1.** | Çima kûçik hilpêdike pêş/xwe diavêje pêş?<br>*(Wêneyên 1-2mîn nîşan bidin)*<br>(Epîsode 1: Armanc) | Dixwaze mişk bi dest bixe/bigire/bide pey wî/bi mişk re bilîze<br>Wî mişkî dixwaze<br>(Da ku mişk) + LÊKER (bi dest bixe, bigire) | ji vir diçe/direve/dixwest hilpêke<br>Kûçik her gav(ê) hilpêdikin | 0 1 |
| **D2.** | Kûçik xwe çawa hîs dike?<br>*(Wêneyê 3mîn nîşan bidin)*<br>(PRN wekî reaksiyon) | bi hêrs/xerab/hêvîşkestî/ birîndar/bi êş/ne xweş/ne rihet | baş/kêfxweş | 0 1 |
| **D3.** | *Pirsa D3 bipirsin, heke zarok bersiva D2 rast dabe, lê sedem bi nav nekiribe. Heke sedem bi nav kiribe, puanekê ji bo D3 jî bidin zarok û derbasî pirsa D4 bibin.*<br>Bi fikra te, çima kûçik bi hêrs/ hêvîşkestî/ bi êş hwh. e/ye?[8] | Nikarîbû mişk bigire, serê xwe darê xist/xwe darê xist/ wê biêşe ku yek li darê/darekê bikeve<br>Mişk filitî/revî çû | bersiveke ne rast/bê eleqe | 0 1 |
| **D4.** | Çima kurik hilpêdike jor/ser darê<br>*(Wêneyê 5mîn nîşan bidin)*<br>(Epîsode 2: Armanc) | Dixwaze (dîsa) balona xwe bi dest bixe/bigire (Dîsa) balona xwe dixwaze<br>(Da ku balona xwe [dîsa]) + LÊKER (bi dest bixe, bigire) | Dixwaze hilkişe darê | 0 1 |
| **D5.** | Kurik xwe çawa hîs dike?<br>*(Wêneyê 6mîn nîşan bidin)*<br>(PRN wekî reaksiyon) | baş/pir baş/kêfxweş/şad | xerab/bi hêrs/qehirî/ xemgîn | 0 1 |
| **D6.** | *Pirsa D6 bipirsin, heke zarok bersiva D5 rast dabe, lê sedem bi nav nekiribe. Heke sedem bi nav kiribe, puanekê ji bo D6 jî bidin zarok û derbasî pirsa D7 bibin.*<br>Bi fikra te, kurik çima xwe baş/kêfxweş/şad hwh. hîs dike?[9] | Xwedî balona xwe bû dîsa/balon bi dest xist dîsa.<br>Karîbû balonê + LÊKER (bi dest bixe/bigire) | Ew dikene/wisa xuya dike/ ew disekine an jî bersiveke din ya ne rast/bê eleqe | 0 1 |
| **D7.** | Çima kûçik sicûq bi dest dixe?<br>*(Wêneyê 5mîn nîşan bidin)*<br>(Epîsode 3: Armanc) | Biryar dide/dixwaze sicûq bixwe/yê wî be/bidize<br>Mişk bi dest nexistibû/negirtibû/nikarîbû mişk bi dest bixe/bigire | Dixwaze bi çentê bilîze | 0 1 |

8 Eynî (heman) PRN ya ku zarok di bersiva D2an de gotî, bi kar bînin.
9 Eynî (heman) PRN ya ku zarok di bersiva D5an de gotî, bi kar bînin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | | Kûçik ji Sicûqan hez dikin/Sicûq tamxweş in (Bersivên gelemperî *[generic meaning])* | | |
| **D8.** | Bifikire ku kurik kûçik dibîne. Kurik wê xwe çawa hîs bike? *(Wêneyê 6mîn nîşan bidin)* (PRN wekî reaksiyon) | xerab/bi hêrs/aciz/qehirî /nexweş | baş/kêfxweş/şad | 0 1 |
| **D9.** | *Pirsa D9 bipirsin, heke zarok bersiva D8 rast dabe, lê sedem bi nav nekiribe. Heke sedem bi nav kiribe, puanekê ji bo D9 jî bidin zarok û derbasî pirsa D10 bibin.* Bi fikra te, kurik çima wê xwe xerab/bi hêrs/ aciz hwh. hîs bike?[10] | Kûçik sicûqê wî xwar/bir Kurik dixwest sicûq (bi xwe) bixwe/yê wî (bi xwe) be Ew sicûq yê kurik bûn | bersiveke ne rast/bê eleqe | 0 1 |
| **D10.** | Gelo kurik wê bi pisîkê re bibe heval? Çima? | na, ji ber... herî kem bersiveke maqûl. (ji ber ku kûçîk sicûq xwar/dizî) an jî bersivên din yên maqûl | erê/nizanim/an jî bersiveke din ya bê eleqe | 0 1 |
| **D11.** | **Tevahiya puanên gihîştî ji 10:** | | | |

[10] Eynî (heman) PRN ya ku zarok di bersiva D8an de gotî, bi kar bînin.

**Protokola Çîroka Çêlikan**

Gotin / Vegotin / Mînakçîrok

| | |
|---|---|
| Navê zarok | ____________________ |
| Dema jidayikbûnê | ____________________ |
| Dema testê | ____________________ |
| Temenê zarok di dema testê de (bi mehan) | ____________________ |
| Keçik/Lawik | ____________________ |
| Lêkolîner | ____________________ |
| Demdirêjiya temasê/têkiliyê bi Z2mîn re (bi mehan) | ____________________ |
| Dema destpêka hêlînê | ____________________ |
| Navê hêlînê | ____________________ |

Berî ku test dest pê bike, misoger bin ku hemû zerf li ser masê bin. Cîhaza qeydkirinê amade bikin. Berî amadekirina zarok dest bi qeydkirinê bikin.

**Dema Amadekirina Zarok**

Wekî mînak bipirsin: *Hevala/ê te ya/yê herî baş kî ye? Tu çi hez dikî di televziyonê de temaşe bikî? Tu ji çîrokgotinê hez dikî? Tu ji guhdarkirina çîrokan hez dikî?*

**Qaîdeyên Pêkanînê (*Instructions*)**

**Qaîdeyên Pêkanînê Ji Bo Gotinê**

